Salı, Temmuz 30

Zarema
Kovara Rexne û Teoriyê

Destpêk Gotar Hevpeyvîn Rojane Nivîsxane Têkilî Hemû Hejmar

YOU ARE AT: Home » Gotar » Lêpirsîna Eşîrtîyê: Muamaya "Eşîrtî"yê di Xebatên Sosyolojîk ên li ser Rojhilata Navîn de

NİVÎSXANE

Eyyûb Kerîmî
Kurd wek Qurbaniyên Sê Îdeolojîyan*

Zeynep Sultan Atlı
"Şerê Newala Qeremûsê" di Klama Salihê Bey

Edith Szanto
"Zerdeşt Kurd bû!": Zerdeştîya Nû di nav Kurd de

Kamal Soleımanı
Kamal Soleimani: Dîndar çi Misilman çi ne-Mi
Nikarin li Derveyî Paradîgmaya Netewe-Dewle

Fahriye Adsay
Şaro İ. Garip
Aqlê Protez ê Kolonîyê

HEMÛ BEŞ

Giştî
Gotar
Hevpeyvîn

GOTAR

# Lêpirsîna Eşîrtîyê: Muamaya "Eşîrtî"yê di Xebatên Sosyolojîk ên li ser Rojhilata Navîn de

By AHMAD MOHAMMADPOUR -KAMAL SOLEIMANI — 10 Mayıs 2019 Yorum yapılmamış



*Ahmad Mohammedpour - Kamal Soleimani**

**Ji Îngilîzî: Fexriya Adsay****

**Puxte:** Di vê nivîsê*** de, em nîyet dikin navlêka 'eşîrtî'yê wek kategorîyeke kolonyal, ku di xebatên civakî yên li ser Kurdan û bi giştî yên li ser Rojhilata Navîn de wek têgeheke berbiçav derdikeve pêş, ji hev veçirînin. Eşîrtî, ku bi awayekî keyfî hatîye bikaranîn, nemaze di xebatên akademîk yên mewcûd ên li ser Kurdistanê de cîyekî navendî girtîye. Hin berhemên antropolojîk ên berê ewqas pê de çûne ku eşîrtî wek "DNA"ya gelê Rojhilata Navîn dîtine. Bi bikaranîna xebatên nû yên li ser Amerîkaya Latîn, Afrîka û Asyaya Navîn, em îdia dikin ku emilandina eşîrtîyê, wek ku qaîdeyeke xwezayî ya civaka Kurd be, bûye sedema şaştemsîl û zêde besîtkirina jîyana sosyo-polîtîk a li Kurdistanê û Rojhilata Navîn. Ji alîyekî ve, xebatên akademîk yên heyî yên li ser herêmê di aleyhê civatên bindest de (w.m.; Kurd) gotarên dewlethez-neteweperwer hilberandine. Peywenda dîrokî ya hêzên kolonyal û netewe-dewletên bi "eşîr û eşîrtîyê re şer dikin" bi peydabûna gotarên bîyopolîtîk ên nijadperest re rastî hev hatin. Loma, ji bo pênasekirina hin netewe an komên etnîk emilandina navlêka eşîrtîyê, divê tenê wek bikaranîna kategorîyên sosyo-antropolojîk neyên dîtin. Ji ber vê, em angaşt dikin ku **alîyên etîk û îmayên emilandina eşîrtîyê ji alîyê hêzên kolonyal û dû re ji alîyê netewe-dewletan ji bo pênasekirina komên etnîk divê neyê piştguhkirin**.

**Peyvên sereke:** Kurdistan, Eşîrtî, Eşîrî, Neteweperwerî, Kolonyalîzm, Rojhilata Navîn

**Destpêk**

Lêkoleran bi awayên cuda eşîrtî pênase kirîye: eşîrtî li dû hev wek qaîdeyeke rêxistina civakî ya nîv-bîyolojîzebûyî (Lentz, 1995: 317), koalîsyonên sîyasî (Barth, 1953), nasnameyên etnîk an merivî (Jabar, 2003: 75; Charrad, 2011: 49), an komên lokalîzebûyî (Tapper, 1983: 4) hatine pênasekirin. Gelemperîbûn û kêmasîya pênaseyeke zelal li alîyekî, ev nêrîn li fenomena ber destê xwe nakolin û nikarin emilandina kolonyal a vê navlêkê bidin ber pirsan. Bi berevajî, em dibêjin bêyî boçûneke veçirîner a di lênêrîna çêbûna dîrokî ya vê mefhûmê û ronîkirina awayên ku aktorên civakî-sîyasî navlêkê didin hestkirin, îcra dikin û mizakere dikin, pênaseyeke 'eşîr'ê ku bi awayekî gerdûnî bikaribe bê emilandin, ne bêîmkan be jî, problematîk e. Lênêrîneke lezgîn a li pênaseyên heyî ji vê angaşta me re delîl dabîn dike. Wek mînak, Jabar (2003: 76) eşîrê wek "kevintirîn, qewîtirîn mewcûdîyeta civakî ya li Rojhilata Navîn" pênase dike û bi ser de angaşt dike "eşîr" mewcûdîyeteke zêdetirîn bi polemîk e jî, û bi vî awayî hewldanên manedar ên pênasekirinê notralîze dike (b.n.b.). Anegorî, hewldana Asfura-Heim (2008: 3) ya bo pênasekirina "eşîr"ê di peywenda Iraqê de mînak e ku navlêkê wek ku pir aşîkar be qebûl dike dema eşîran wek melezîyên gundî-bajarî ku bi girêyên merivtîyê (rastîn an xeyalî), têkilîyên îltimasker û komeke adetên hevpar, bi hev ve ne, pênase dike. Her wiha, **pênaseyeke wiha di zanista civakî ya serdest de ne tenê pir zêde bêreng e lê wek benîşt e jî, ev dikaribûye ji bo têgehên wek klan, etnîsîte an eşqîyayan jî bê emilandin** (*Cf.* Schermerhorn, 1970; Smith, 1991; Hutchinson & Smith, 1996, û Eriksen, 2010 ji bo pênaseyên etnîsîteyê).[1] Îlankirina komeke dîyar a mirovan tenê wek eşîr, bi giştî çeşitdarîya komê ji holê radike û wê di nav gotareke medenîyetê ya hegemonîk de di cîyekî taybet de bi cî dike.

Eşîrtî cîyekî navendî dagir dike di dîroka teorîya civakî ya ewronavendî de û dikare bê dîtin ku yek ji têgehên zêdetirîn hatîye emilandin ji alîyê zanyarên civakî yên li ser herêmên Rojhilata Navîn, wek mestere Kurdistan, dixebitin (Leach, 1940, Barth, 1953; Tapper, 1983; McDowall, 1988 û 1992; Yaphe, 2000; Bruinessen, 2002; Kennedy, 2015; Ross û Mohammadpour, 2016; Tugdar û Al, 2018). Car bi car ji bo ravekirina neserketina dewletbûnê (Bruinessen, 1992; Bozarslan, 2006; Tahir, 2007; Stansfield, 2010), wek alava manîpulasyona dewletê (Cleveland û Bunton, 2012; Mansfield, 2013; Stancati, 2010; Carroll, 2011; Erkmen, 2012; Radcliffe û Westwood, 1996; Dunkerley, 2002; Centeno, 2003; Saylor, 2014; Salzman, 2008; Rowland, 2009; Dukhan, 2014; Ortega, 2009; Carroll, 2011), an wek astenga li ber dewletavakirinê li Rojhilata Navîn a hemdem (Rowland, 2009; Dukhan, 2014; Ortega, 2009; Anca, 2012; Jabar, 1999; Carroll 2011; King, 2013) tê bikaranîn. Ligel navendîbûna wê ya di sîyaseta Rojhilata Navîn de, eşîrtî bi gelemperî wek karakterekî şexsî tê dîtin, ku heta hin antropologan wek DNAya gelê Rojhilata Navîn (Salzman, 2008: 1)[2] bi nav kirine. Yên din peyvên wek "vegera li eşîrtîyê" (Rowland, 2009: 28), "berxwedêrîya eşîran"(Dukhan, 2014: 1) di sîyaseta Rojhilata Navîn de, peydabûna "eşîrtîya modern" (Ortega, 2009: 1), "nû-eşîrtî" (Anca, 2012: xxii), an "eşîrên dewlethez" (Jabar, 1999, nql. di Kennedy, 2015: 11 de) bi kar tînin. Di hin mînakan de, eşîrtî wek astengeke pêşmodern li ber çêbûna dewleta modern an wek hêzeke ku valahîya ji wê maye tijî dike, tê dîtin (Carroll, 2011: 11). Zanyarên civakî têgeha "eşîr"ê tenê wek guherbareke serbixwe, aleteke ku di îzahekê de bê bicîkirin, tînin bîra xwe (Hymes, 1968). Wek encam, digel navendîbûna wê ya di xebatên heyî de û emilandina wê ya gerdûnî, ew hê jî nehatîye îzehkirin.

Di xebata me de, bi awayekî razber ji lêkolînkirina *eşîrtîyê* bêtir, em angaşt dikin ku **eşîrtî hatîye çêkirin, tanzîmkirin û emilandin ji alîyê hêzên kolonyal ve da ku modalîteya piralî ya nîzamên civakî-sîyasî yên çeşitdar û heterojen besît bikin**. Emilandina têgeheke wisa tanzîmker ancax bi rêya teşebiseke veçirîner (deconstructive) a di xebateke li ser pêkhateyên wê yên têgehî û empîrîk di nav têkilîya bi çanda kurd û yên dora wê re, dikare bê famkirin. Berevajî teorîya civakî ya zal, ku meyldar e bipirse ka eşîrtî ji netewe-dewletê re

NİVÎSXANE

Eyyûb Kerîmî
Kurd wek Qurbaniyên Sê Îdeolojîyan*

Zeynep Sultan Atlı
"Şerê Newala Qeremûsê" di Klama Salihê Bey

Edith Szanto
"Zerdeşt Kurd bû!": Zerdeştîya Nû di nav Kurd de

Kamal Soleımanı
Kamal Soleimani: Dîndar çi Misilman çi ne-Mi Nikarin li Derveyî Paradîgmaya Netewe-Dewle

Fahriye Adsay
Şaro İ. Garip
Aqlê Protez ê Kolonîyê

HEMÛ BEŞ

Giştî

Gotar

Hevpeyvîn

asteng e an wê hêsan dike, **armanca me teşxiskirina alozîyên têgehî û kêmasîyên empirîk e ku çeşitdarîyeke berfireh a awayên rêxistîbûna civakî dadixe tek heyîneke xwedî taybetmendîyên gerdûnî yên nasbar.** Bi rêya bikaranîna xebatên li ser Amerîkaya Latîn, Afrîka û Asyaya Navîn, em hewl didin rehên kolonyal ên "eşîrtî"yê, ku emilandina wan di qada xebatên li ser kurdan de lêkolînerîyeke teorîk û empîrîk a bêbingeh çêkirîye, raber bikin. Lewma, em cehd dikin bi pirsên taybet bidin dû vê, ka gelo li pişt vê têgeha "eşîrtî"yê çi heye û *kî* wê bi bîr dixe. Di xebatên têkildar de boçûnên kêmker (reductionist) çi ne? Di nav kîjan peywendan de û bi çi armancan teşebisên kêmker dibin tiştên aşîkar? Îdiaya li vir ev e ku têgeha eşîrtîyê di lîteratura zanista civakî de ji helwesta lixwenêrînê (self-reflexivity) bêpar e û ji qisûrên têgehî û teorîk mizdarîb e, bi taybetî dema bi etnîsîte û neteweperwerîyê re tê wekhevkirin (*Cf*. Manchanda, 2018).

A din, **eşîrtî wek têgeh di serdema kolonyal de peyda bûye, û emilandina lêkolerên Kurd û ne-Kurd a vê têgehê, ji fehma me ya dînamîzma civakî-sîyasî ya Kurdistanê re dibe asteng.** Ji gewherîkirina awayên cuda yên rêxistîbûna civakî wêdetir, em dikevin dû îstikrara têgeha eşîrê bi awayê ku tê emilandin, jîyîn, û tecrubekirin ji alîyê arezûya kolonyal û bendeyên wê ve. Û, ger em bifikirin ku gelê Kurd qismeke girîng a gelheya li Îran, Iraq, Tirkîye, Sûrîye û Libnanê pêk tîne, car bi car em Kurdistan û Rojhilata Navîn li şûna hev bi kar tînin. **Em, wek civaknasê Tirk İsmail Beşikci, Kurdistanê wek kolonîyeke navneteweyî nas dikin ku ji alîyê çend dewletên Rojhilata Navîn hatîye kolonîkirin** (bnr. Beşikçi, 1990).[3] Îdiayeke bi vî rengî nîqaşa me ye dîyalektîk a li Kurdistan û Rojhilata Navîn biheq derdixe.

**Têgeha "eşîr"ê**

Nifşê pêşî yên antropologan gelek caran *eşîr* wek "di rêzeke wêrarî de merhaleyek" pênase kirine (Godelier, 1977: 42), "ku ji komên (bands) kêm pêşketî û qebîleyên pêşdetir vediqete" (Sahlins, 1961: 323), û dawîya dawî digihêje çêbûna dewletê. Di van modelan de, eşîr, li gor çêbûna dewletê wek awayên pêş û kêm pêşketî yên rêxistinên civakî-sîyasî tên pênasekirin. Li gor vê nêrînê, **hevhebûna dewlet û eşîran wê anomalîyekê pêk bîne** di her yek dorhêla civakî-sîyasî de. Bi gotineke din, her li kuderê be hebûna dewleta modern dibe delîla nemabûna eşîran. Yên din *eşîran* wek takên ku "*axeke hevpar, zimanekî hevpar, û çandeke hevpar*" parve dikin (Honigmann, 1964: 307), "grûbeke komên (group of bands) ku axeke biserhevve parve dikin" (Linton, 1936: 231; û bnr.: Radcliffe-Brown, 1913; Fortes û Evans-Pritchard, 1940; Lewis, 1968; Tapper, 1983 û 2006 ji bo pênaseyên manend) pênase kirine. Yekem pênase, eşîran wek yekeyên civakî-sîyasî yên cihê ku aidî peywendên civakî-sîyasî yên pêş-dewletî bûn, kategorîze dike, ya duyem, eşîran di nav çarçoveyeke wêrarî ya firehtir ya awayên curbecur ên rêxistinên sîyasî de bi cî dike, bi tu awayî ji komên etnîk an neteweyan cuda nake. Di herdu pênaseyan de jî eşîr wek asta derbasbarîyê (permitivity, geçirgenlik) tê dîtin, ku ji ber pêşdeçûna civakî bêje nebêje wê ji holê rabin.

Di peywendên **Rojhilata Navîn û Asyaya Navîn de**, **navlêka eşîrî an eşîran gelek caran ji dêvla koçerên pastoral tê bikaranîn** (Amanolahi, 1975; Beck, 1986 & 1991; Scholz, 2002; Tapper, 2006; Garthwaite, 2009) an ji dêvla *gundewar* (Noelle, 1997; Amanolahi, 2004; Oraz, 2008; Barfield, 2012; Potts, 2014; Sungur, 2015), ku awayên rêxistinî yên gundewar, carna, dikevin nav *qadên bajarî* (Roy, 2000; Azamat, 2004; Maisel, 2014). Her çiqas herdu xwedî taybetmendîyên bi awayekî gerdûnî nasbar in jî, koçer û gundewar ne eynî awayên jîyanê, ne jî heman nîzamên civakî ne. Lê, hin xebatên li ser Rojhilata Navîn bê xem van herduyan dikin yek. Hin xebat jî hene ku eşîran wek pêkhateyek prîmordîyal an awayekî rêxistina civakî ya li Rojhilat û Asyaya Navîn pênase dikin (Gullette, 2010). Wek mînak Alon (2009) û Rabi (2016) dema li mefhûma "eşîrtî"yê fikirîne, teza hevbandorîya di navbera eşîr, dewlet-sazkirin û neteweperwerîyê de li Rojhilata Navîn, ava kirine.

NÎVÎSXANE

Eyyûb Kerîmî
Kurd wek Qurbaniyên Sê Îdeolojîyan*

Zeynep Sultan Atlı
"Şerê Newala Qeremûsê" di Klama Salihê Bey

Edith Szanto
"Zerdeşt Kurd bû!": Zerdeştîya Nû di nav Kurd de

Kamal Soleımanı
Kamal Soleimani: Dîndar çi Misilman çi ne-Mi Nikarin li Derveyî Paradîgmaya Netewe-Dewle

Fahriye Adsay
Şaro İ. Garip
Aqlê Protez ê Kolonîyê

HEMÛ BEŞ

Giştî

Gotar

Hevpeyvîn

Bi gelemperî, xebatên navborî, belkî ne bi vê qestê be, **berdewamîya prîmîtîvbûna ku di jîyana eşîrî ya gelên ne-Rojavayî de xwe nîşan dide, îma dikin**. Di vê rewşê de, ger mantixa serdest bê pejirandin, divê an hebûna dewletê bê înkarkirin an berdewamîya prîmîtîvbûnê bê pesendkirin. Li dijî modela Ewropî (yanê, modela gerdûnî/wêrarî), divê anomalîyên Rojhilata Navîn û Asyaya Navîn bibin qaideya giştî, an li van deverên dinyayê dewletên niha, aktorên pîrozkirî yên moderníteyê divê tunebin. Bi gotineke din, an ev civakên ne-Rojavayî bê dewletên modern in, an wan ew qevaztina wêrarî ya hewce nikaribûne pêk bînin. Di eslê xwe de, teswîrên bi vî rengî fameke hîyerarşîk a dîroka dinyayê raber dikin, ku, li gor vê nêrînê, neteweyek taybetmendîyên wê pêş-modern hebin, tê qebûlkirin ku ew di merhaleyên wêrarî ya gerdûnî de li paş maye. Fameke wiha hîyerarşîk a "dîroka dinyayê" herî baş di fehma Hegel a dîrokê de xwe nîşan dide, ku neteweyan dike du beş, beşek ên xwedî hişmendîyeke zelal a dîrokê û beşek ên ji vê bêpar (Guha, 2002: 39). Li gor vê, îdia dike ku

Neteweyên ku hişmendîya wan nefambar e, an dîroka nefambar a neteweyên wiha, ne … mijara dîroka felsefeyê ne, ku hedefa wê di dîrokê de gihiştina zanîna Îdeayê ye -ruhên wan neteweyên ku [bûne] xwedî hişmendîya rêgeza xwe ya esasî, û haydar bûne ku çi ne û kirinên wan tê çi maneyê, mijara wê ne (Guha, 2002: 35).

Nêrînên wiha ewronavendî, ger çend heb bê binavkirin, di xebata Oliver Roy a li ser Asyaya Navîn ya Nû (2000), ya Azamat a li ser Kazak, Kirgiz û Tirkmenan (2004), berhemên Maisel ên li ser eşîrên Erebistana Siûdî (2014), lêkolîna Oraz a derbarê Komarên Sovyeta kevn û Asyaya Navîn (2008) de, xebata Sungar a derbarê Paştûnan (2015), û berhema Ortega ya derheqê guncavbûna dîroka Dubaîyê (2009) de eşkere ne. Ne zehmet e mirov lê hay bibe ku eşîrtî di gelek xebatên civakî-sîyasî yên Rojhilata Navîn û Asyaya Navîn de wek pêkhateyeke berdewam derketîye pêş.

Di berawirdkirina bi yên Rojhilata Navîn û Asyaya Navîn de, lêkolerên xebatên Afrîkayê bi gelemperî ji emilandina navlêka eşîrê direvin, ji ber ku eşîrtîyê wek têgeheke berhema serdema kolonyal dibînin. Zêdetirî çil sal berê, lêkolerê Afrîkî Aidan Southall ev babet wek "*îluzyona eşîrê*" (1970: 28) pênase kir. Wî gazin dikir ji nebûna zelalîya analîtîk û îdia dikir ku sînorên di navbera eşîr, kom (band), û qebîleyan de, ne keyfî bin jî, zêde şêlû ne (b.n.b.). Christopher Lowe, lêkolerekî xebatên Afrîkî, di dijderketina qedrê analîtîk a têgehê de wêdetir diçû, angaşt dikir hebûna eşîrekê ne tenê *wehşeta hov* (primitive) nîşan dike lê *taybetmendîyên modern* ên rêxistina civakî ya hemdem a li Afrîkayê jî vedişêre (1997: 3). A din, li hemberî emilandina 'îluzyona eşîrê" ya hevpar, ji bo analîzeke bihûrgilî ya rewşên taybet hişyarî da (b.n.b). Bi gotineke din, tek pênaseya 'eşîr'ê têr nake.

Divê em li sedemên li pişt bibîrxistina navlêka eşîrê ji alîyê aktorên dîyar di nav peywendeke etnografîk a taybet de bikolin. A rast, l**i gor gelek zanyarên xebatên Afrîkayê, sazkirina eşîrtîyê rêya desthilatdarîya kolonyal vekirîye li Afrîkayê**. Dîyar e gelek ji van zanyarên, ji bo ku bikaribin bandora kolonyalîzmê li ser çandên Afrîkî rave bikin, tercîh dikin ji dêvlê "koma etnîk" bi kar bînin (*Cf*, Vail, 1991; Wiley, 2003; Miguel, 2004*;* Thiongo, 2009; Justin û Gona, 2013). Ev zanyar her teşebisa pênasekirina gelên Afrîkî wek 'civatên eşîrî' rexne dikin. Angaşt dikin navlêka eşîrê kêmkerîyeke (reductionism) pir mezin nîşan dide. Wek têgehekê eşîr xumamî ye, ji pênaseyeke zelal bêpar e û têra ravekirina têkilhevîya civakên Afrîka, Asya û Amerîkaya Latîn nake (Mafeje, 1971; Ekeh, 1990; Pagila, 2006; Wiley, 2013). Ramangerên postkolonyal bi israr li ser pirsgirêka hilberîna zanînê disekinin. Berhemên wan êdî navendîbûna fama Rojavayî ya derheqê "Şerq"ê, di çêkirin, pênasekirin û temsîla gelên ne-Rojavayî û înkarkirina têkilhevîya binyadên wan î civakî-sîyasî yên curbecur de, raber dikin.

Ramangerên postkolonyal rexneyên tûj arasteyî nifşê pêşî yê teorisyenên civakî kirin. Zanyarên civakî, yên pêşî bi kêfxweşîya ji hêzên kolonyal û înkarkirina kirdebûna gelên

NÎVÎSXANE

Eyyûb Kerîmî
Kurd wek Qurbaniyên Sê Îdeolojîyan*

Zeynep Sultan Atlı
"Şerê Newala Qeremûsê" di Klama Salihê Bey

Edith Szanto
"Zerdeşt Kurd bû!": Zerdeştîya Nû di nav Kurd de

Kamal Soleımanı
Kamal Soleimani: Dîndar çi Misilman çi ne-Mi Nikarin li Derveyî Paradîgmaya Netewe-Dewle

Fahriye Adsay
Şaro İ. Garip
Aqlê Protez ê Kolonîyê

HEMÛ BEŞ

Giştî

Gotar

Hevpeyvîn

xwecih tawanbar kirin (Werbner, 2017: 438). **Li gor damezrênerên teorîya postkolonyal teorîya modern, bi maneya firehtir ji bo xizmeta teşebisên kolonyalîst yên Rojavayî çêbûye.** Wek ku Julian Go dinivîsîne: "Teorîya civakî di nav, û heta radeyekê, ji împeratorîya modern zaye" (2017: 2). Di navenda metropolên DYA û Ewropayê bisazî bûye û xwe spartîye wan, teorîya civakî beşdarî lêgerîna împeryal bûye da ku hefsarê tundîya li hemberî neteweyên bendekirî berde. Xebat û teorîyên "zanistî" wek îdiayên raserbûna nijadî ya Rojava xizmet kir û dagirkirina leşkerî an sîyasî ya welatên dawîya mayî ya dinyayê rewa kirin (Go, 2017: 67). **Ramangerên postkolonyal li ser bandora civakî-sîyasî û derûnî ya kolonyalîzmê jî bi hûrgilî xebitîn, ka yên kolonîkirî çawa dagirkerên xwe texlîd kirine û awayên reftar û fikirîna kolonyal xuyî kirine (dahûrandine)** (Dwivedi and Kich, 2013).

Zanyarên civakî taximek têgeh û terminolojî jî îcad kirin ku gelên xwecih pênase bikin û karekterîzasyonên keyfî li ser çandên ne-Rojavayî empoze bikin (Pels, 1997: 169). Xebatên hê nêzîktir bi radeyeke girîng xwe-vebeyîntî (self-reflexivity) û jinûvelêhûrbûna rexneyî ya ferzkirinên têgehî yên dewra kolonyal nîşan dan. Talal Asad, di kitêba xwe ya giranbiha *Anthropology and the Colonial Encounter* de dest nîşan dike wê rola navendî ya kolonyalîzma Brîtanî di fikr û pratîka antropolojîk de, ku wek disiplîneke akademîk geş bûye û xwe terxan kirîye ji bo ravekirina yên ne-Ewropî bo girseyên Ewropî (Asad, 1973). Di *Anthropology as a Cultural Critique* de jî George Marcus û Michael Fischer navlêka "krîza temsîlîyetê" îcad kirin û heman mesele bi awayekî cuda şîrove kirin. Wan bi taybetî bêbiryarîya di zanistên beşerî û civakî de û têr-nebûna alavên ji bo pênasekirina "realîteyên civakî" binxêz kirin (Marcus û Fischer, 1986: 7). Rexneyên wan, tevî redîyeya postmodern a objektîvîzmê, zanist wek awayekî înduktîvîzma pozîtîvîst bi nav kir, ku îdia dike gihiştîye "heqîqeta mitleq" (Haviland û yên din, 2010: 67). Lê, di akademîyaya li ser Rojhilata Navîn de, alîyekî gotara eşîrtîyê pir hindik an qet bal nekişand di emilandina wê ya ji alîyê him hêzên kolonyal him netewe-dewletan ji bo pênasekirina nerazîbûnên etnîk. Ev di qada Xebatên Kurdî de jî piranî ji ber çavan revîyaye. Helbet, emilandina navlêka eşîrtîyê ji alîyê lêkolerên vê qadê û dewletan divê wek hev neyê dîtin. Dîsa jî, gelek caran **întelektuelên civatên serdest sîyasetên dewletan pesend dikin an ji bo neteweperwerîya dewletê rêya epîstemolojîk dirust dikin**.

**Di xebatên kurdî de eşîrtî**

Di çend dehsalên dawî de, zanyarên civakî her diçe zêdetir rexne li pêşîyên xwe digrin (Go, 2016; Ludden, 2002). Ligel boçûnên xwe-vebeyîntîyê, tevkarîya abîdewî ya akademîyaya dij-kolonyal û post-kolonyal e ku hîmên paradîgmatîk yên zanistên civakî ji hev xistin (Smith, 2012).[4] Digel ku di Xebatên Amerîkaya Latîn (Fisher, 2014), Afrîkî (Gibson, 2011), û Berxwedena Amerîkaya Bakur de (Choudry û yên din, 2013) pêşketineke berbiçav çêbû jî, di peywenda Xebatên Rojhilata Navîn û bi taybet Xebatên Kurdî de pir kêm tişt hatin kirin.

Ev rastî, ya ku lêkolerên Xebatên Kurdî navlêka "eşîr" û "eşîrtî"yê bê xem bi kar tînin, raber dike ku bi gelemperî haya wan jê tuneye dibin piştevanên îdeolojîk ên van têgehên kolonyal. Di xebata xwe ya sala 1978a de, Hanna Batatu, dîroknasekî Iraqî yê navdar, binyada civakî ya Kurdistana Başûr/Iraqî wiha pênase dikir:

Li Kurdistana çîyayî… beg an axayên eşirî, ku ji koçerên çîyayî ne û hukim li gundîyên bêeşîr dikin. Pozisyona van hemû tebeqeyên serkêş ji bin ve xwe dispêre hêza raser an hêza leşkerî, pêwendiya xwînî an merivantîyê, û, ji nêrîna eşîrvanên wan î tebeqeya jêrîn, ne şert e yên eşîrên hîmayekirî tê de be, xwe dispêrin adetên eşîrî yên pir kevn" (1978: 10).

Xwendineke lezgîn a jêgirtina jorîn têr dike mirov lê hay bibe ku nikare bê pênasekirin, ka **bi "eşîr"ê qala çi dike**. Ji me re tê gotin ku hebûna wan xwe ne dispêre merivantîyê ne

NIVÎSXANE

Eyyûb Kerîmî
Kurd wek Qurbaniyên Sê Îdeolojîyan*

Zeynep Sultan Atlı
"Şerê Newala Qeremûsê" di Klama Salihê Bey

Edith Szanto
"Zerdeşt Kurd bû!": Zerdeştîya Nû di nav Kurd de

Kamal Soleımanı
Kamal Soleimani: Dîndar çi Misilman çi ne-Mi
Nikarin li Derveyî Paradîgmaya Netewe-Dewle

Fahriye Adsay
Şaro İ. Garip
Aqlê Protez ê Kolonîyê

HEMÛ BEŞ

Giştî

Gotar

Hevpeyvîn

hîmayekirinê, ew ne berîvan in, ne koçer in, ne gundî ne. Ew hêzên leşkerî yên çîyayî ne, û qaweta xwe ji “adetên eşîrî yên pir kevn” negirtine. Dîsa, Barth (1953) temama civaka Kurd a li başûr wek eşîr pênase dike, û îdia dike ku “sîstema eşîrî ya xwe dispêre xwînê *bi awayekî xweser Kurd* e (*autonomously Kurdish*)” (b.n.b. 10). Bi awayekî manend, qebûlkirina Kurdan wek eşîrparêz di piranîya (ne giş be jî) nivîsên li ser Kurdistanê yên lêkolerên Kurd û ne-Kurd dişibin hev (*Cf*. Bedlisi, 1988; Mustafa, 1998 û 1999; Ghaftan, 2006; Gharadagi, 2008; Nabaz, 2007; Miran, 2009, Sanandaji, 1972; Borzoei, 1999; Hirat Sadjadi, 2003; Jalaipour, 1990; Sanandaji, 1998; Jalaipour, 1999; Tavakkoli, 1998; Yasemi, 1994; Kinnane, 1964; Nikitine, 1956; Bois, 1965; Olson, 1989). Lîteratura bi giştî, zimanê weşanê her çi be, civaka Kurd wek civakeke ku bi awayekî gewherî eşîrî *maye* teswîr dikin (*Cf*. McDowall, 1988: 464; 1992). Wadie Jwaideh, dîroknasê Iraqî ku bi berhema xwe ya li ser Kurdan tê naskirin, civaka Kurd wiha pênase dike:

ji eşîrtîyê wêdetir sîstemeke sîyasî ya xweser a kurdan ti car bi pêş neketîye. Ew serkêşên Kurd, ku di damezrandina sîstemên wiha de bi ser ketine, dane ser şopa rêxistineke sîyasî ya îslamî ne ya Kurdî. Wek encam, sazîyên bingeh-eşîr, ji sazîyên bingeh-dewlet bêtir bûne sazîyên sîyasî yên Kurdan ên sereke… Yek ji taybetmendîyên pêşçavtirîn ya jîyana eşîrî ya Kurdan, qewîtîya derasayî ya hesasîyeta eşîrî ye (Jwaideh, 1960: 30-33).

Nêrînên wiha gewherîker di lêkolînerîya dawîtirîn a li ser Kurdan heta bibêjî dewam dike. Ev nemaze di berhemên ji alîyê akademisyenên spî de wiha ye. Wek mestere, Nerina Weiss, di madeya xwe di “Social Organization and Family Life” ya di *The Kurds: An Encyclopedia of Life, Culture, and Society* de wiha dinivîsîne: Rêxistîbûna eşîrî roleke navendî lîstîye di qewîkirina Kurdistana Iraqê de û hê jî dilîze. Bi saya eşîran e, û li vir bi taybetî bi serkêşîya eşîra Barzanî ye ku têkoşîna neteweyî ya Kurd a li dijî Iraqê hatîye seferberkirin (2018: 85).

Wek ku li jor hat dîyarkirin, navlêka eşîrtîyê di xebatên derbarê Kurdan û Kurdistanê de cîyekî mezin dagir dike (bnr. Gunes, 2016; Jongerden, 2016; Entessar, 2016; Hassanpour, 2015; Aziz, 2011, Tahiri, 2007; Ahmedi, 2018). Eşîrtî wek astenga sereke ya li ber neteweperwerî û netewetîya Kurdî tê dîtin. A din, lêkolerîya heyî eşîrtîyê wek merhaleyekê dibînin di wêrara jîyana civakî ya Kurdan de (Yadirgi, 2017).  Li gor vê, **sîyasetmedarên Kurd ên modern li gor asta rojeva wan a ‘dij-eşîrî’ tên xelatkirin**, ku raber dike lêkoleran gotara dewletê çiqas xûyî kirîye. Em werin ser rewşenbîrên dewlethez,  wê hewesa Kurdan ya neteweperwer jî wek awayekî eşîrtîyê dibînin. Wek mînak, sosyologê Tirk Özcan di berhema xwe ya 2006a de, derfeta serxwebûna Kurdên li Iraqê bi derfeta qewîbûna “eşîrtîya Kurdan” ve girêdide (2006: vi). (Ev pir baş îzeh dike ka dewleta Tirk her tim çawa qala sîyaseta Kurdan a li başûr dike) Özcan loma dibêje “Ka eşîrtîya Kurdan wê li bakurê Iraqê bi ser keve an na… ev hê têra  xwe pirseke tevlihev e” (b.n.b.). Bi nêrîna Özcan û yên wek wî, **israra Kurdan a ji bo parastina xwe, bi serê xwe eşîrtî ye**.

‘Eşîr’ wek awayekî rêxistîbûna civakî ya kevn, kevneşopî û ‘pêş-modern’ tê pejirandin. Di rewşa Kurdan de, ji me re tê gotin ku hebûna xwe didomînin û sîyaseta modern a Kurdan dişêwînin.[5] Wek encam, dîrokên gelê Kurd gelek caran dibe dîroka serekeşîran, “ku posizyona wî” dibêje van Bruinessen, “*dîyar dike ka eşîra wî wê li dijî tevgera neteweyî be, wê beşdar bibe an bê alî bimîne.*” (1992:10, dûpat hatîye lêzêdekirin). Ji oryantalîstên din cuda, van Bruinessen—ku di 2012ya de îdiaya wezîrê Tirk ku “Kurdî ne zimanê medenîyetê ye” dubare kir— ‘**eşîrtîya Kurdan bêtir wek anomalîyekê dibîne, wek tiştekî li hemberî qaideya giştî ya ‘wêrar û pêşketina civakî’ dibîne**.[6] Ji ber vê ye ku

Serhildanên mezin ên civakî yên bîst salên dawî rê li ber tunebûna eşîran venekir… Dîyar e ev dîyardeya pre-modern a eşîrê bêrxwedêrî û qabilîyeta adabtebûnê nîşan da û heta ji gelek alîyan ve eşîr û eşîrtî ji bîst, sî salên berê bêtir di civaka Kurd de belave bûne (2002: 165).

NÎVÎSXANE

Eyyûb Kerîmî
Kurd wek Qurbaniyên Sê Îdeolojîyan*

Zeynep Sultan Atlı
“Şerê Newala Qeremûsê” di Klama Salihê Bey

Edith Szanto
“Zerdeşt Kurd bû!”: Zerdeştîya Nû di nav Kurd
de

Kamal Soleımanı
Kamal Soleimani: Dîndar çi Misilman çi ne-Mi
Nikarin li Derveyî Paradîgmaya Netewe-Dewle

Fahriye Adsay
Şaro İ. Garip
Aqlê Protez ê Kolonîyê

HEMÛ BEŞ

Giştî

Gotar

Hevpeyvîn

Di lêkolînerîya Rojhilata Navîn de, ne karekî hêsan e mirov her tim boçûna lêkoleran a bo civatên bindest ji yên dewletan cuda bike. Wek mînak, dîroknasê binavûdeng ê Îranê Ervand Abrahamian, yên ne-Faris gişan wek “eşîrên [ku]nêzî panzdeh yekeyan pêk tînin” teswîr dike û dijmêre “*Qaçar, Kurd, Tirkmen, Belûcî, Ereb, Qaşqayî, Bextîyarî, Lûr, Mamasanî, Boyr Ahmedî, Hezarî, Şahsavan, Evşar, Tîmurî û Xemsehs*…” Lê ew “di nav *civatên xwe yî xwedî binyad, hîyerarşî, ziman û zarava, û gelek caran xwedî aborîyên xwe, ku heta dawîya sedsala nozdemîn, xwebixwe bû, dijîn* (2008: 21, dûpat hatîye lêzêdekirin). Lê nêrînên Abrahamian sîtava gotara fermî ne, ji ber ku dewletê civatên ne-Faris (yanê Ereb, belûcî, Lûr, Kurd û Tirk) hemû wek eşîr îlan kirine ji gava ku di 1912a de li Îranê Daireya Xebatên Eşîr û Koçeran hatîye avakirin.[7] Hamid Ahmadi, nivîskarekî din î Faris, angaşt dike ku civata Kurd bi temama xwe tenê eşîrek in (2008). **Hamid Dabashi, nivîskarekî Faris î postkolonyal û axaftinhez, wek “nasnameyên çêkirî yên etnîsîzebûyî (eyn wiha)”, ji ber ku dijberên nasnameya civata Faris a hakim in, ku wek rastîyeke bêzirar a xwezayê dibîne, bi hemû nasnameyên ne-Faris re dixeyide** (2016: 17). Di bin hîmayeya Komara Îslamî de, gotara eşîrtîyê, vêga babeteke akademîk e û qismên mezin ên sîyasetê wek eşîr miamele dibînin. Sosyologên Îranî lîteratureke girîng mezin hilberandine li ser qaşo “*jîyan û karûbarên eşîrî*” (bnr. li jêr). Deqên akademîk ên curbicur hene bi navên wek *Qaideyên Sosyolojîyê û Antropolojîya Eşîr û Koçeran* (Tabibi, 2016), *Sosyolojîya Eşîr û Koçerên Îranê* (Safinezhad, 2016), an *Sosyolojîya Tetbîqî ya Eşîran* (Mahmoodi Bakhtyari, 2003), tenê çend berhemên dawî ne.

Di gotara eşîrtîyê de, her kî wê bide dewamkirin, **nasnameya Kurd ji xwe ber pêş-modern tê bicîkirin, û dewlet jî wek xwedîyê rola modernîzekirina ‘yekeyên eşîrî” tê qebûlkirin**. Gotareke wiha di binavkirina berxwedana etnîk ya wek ‘israra pêş-modernîteyê de kirina dewletên kolonyal rewa dike.’ Li gor vê nêrînê, şerek heye di navbera dewletê, yanê temsîlkara modernîteya sekuler, û nasnameya Kurd de, ku temsîlkara eşîrtî û heydûdî yê ye (ji bo bêtir agahî bnr. Soleimani, 2017). Bêguman, boçûneke wiha dibe sedema qebûlkirina gotara fermî -di **xwendinên hin çepgirên Iraqî, Îranî û Tirk de jî ne ku ne berbelav e**. Piranîya rewşenbîrîya civatên serdest gotara etno-neteweperwer a dewletên ‘xwe’ xûyî kirine û loma, **neteweperwerîya civatên bindest wek reaksîyoner û tehdîdek ji yekitîya gel re dineqînin**.

Angaşta li dijî emilandina bêxem a kategorîyên ku bi awayekî îdeolojîk hatine tijîkirin divê neyê wê maneyê ku têkilîyên civatî an sîstemên merivantîyê wek nîşanên civakî bi awayekî dîrokî tunebin. Li vir hedef ew e ku ‘rahênanbarîya gerdûnî’ (universal applicability) ya navlêkên wek eşîr, eşîrî û eşîrtîyê bidin ber pirsan. **Ev têgeh, bi wateya niha, bi pênaseyên xwedêgiravî eşkere, ji alîyê desthilatdarîya kolonyalîzmê hatine îcadkirin da ku ne-Rojava wek qelebalixeke homojen teswîr bike li hemberî pozisyona tekane ya Rojava ya li dinyayê.** Dehsalên dawî bûn şahidê gewdeyeke girîng a xebatên rexneyî ku koka lîteratura berê di nav peywenda çêbûna nasnameya Ewropî de bi cî dike (Peterson û Walhof, 2002), ku hewldana îcadkirina eşîr, eşîrtî, an/heta olên xwedî wesfên gerdûnî wek manîfestoyeke Ewropî ya xwe-sehkirinê (self-perception), “wek prototîpa yekitîyê di nav piratîyê de, Ewropa wek nîşana pozisyona kirdeya dîroka gerdûnî” tê famkirin (Masuzawa, 2007: 182). Tişta ku dewletên Rojhilata Navîn îdia dikin ku ‘şerê bi eşîrtî’yê re ye, di eslê xwe de hewldanên çêkirin û jinûveçêkirina ‘eşîran’ e. Ev taybetî jî ji bo ew dewletên bi berxwedana sîyasî ya Kurdan re mijûl bûne, rast e. **Li welatên wek Tirkîye, Îran û Iraqê, polîtîkayên “bê-eşîrkirin”ê yên dewletê ji hewldanên sîstematîk ên guhertina demografîyê, kêmkirina gelheyê û jinûvebicîkirina li herêmên Kurdan pê ve nebûye tiştek.** Wek ku li jêr tê raberkirin, rejîmên post-kolonyal ên Rojhilata Navîn ev gotar û mantixa ku piştevanîya wê dike bi hêsanî kirin malê xwe, bi awayekî ku di pêvajoya civakî ya wêrarî de xwe derxistin jor, Êdinên xwe yî hundirîn jî daxistin merhaleyeke paşverû, kevnar, prîmordîyal.

**Eşîrî, Kurdistan, û berdewamkirina kolonizasyona hundirîn**

NİVÎSXANE


Eyyûb Kerîmî
Kurd wek Qurbaniyên Sê Îdeolojîyan*

Zeynep Sultan Atlı
“Şerê Newala Qeremûsê” di Klama Salihê Bey

Edith Szanto
“Zerdeşt Kurd bû!”: Zerdeştîya Nû di nav Kurd de

Kamal Soleımanı
Kamal Soleimani: Dîndar çi Misilman çi ne-Mi Nikarin li Derveyî Paradîgmaya Netewe-Dewle

Fahriye Adsay
Şaro İ. Garip
Aqlê Protez ê Kolonîyê


HEMÛ BEŞ


Giştî

Gotar

Hevpeyvîn

Navlêkê eşîr û eşîrtîyê ji bo netewe-dewletên modern ên Îran, Iraq, Sûrîye[8] û Tirkîyeyê ji bo pênasekirina Êdinên xwe bûn alavên kêrhatî (Yeğen, 1996; Deringil, 2003; Makdisi, 2002; Üngör, 2012; Soleimani, 2016). Ji dîrokî ve, dewlet û rwşenbîrîya *civatên serwer* tevgerên mixalif ên Kurd wek manîfestoyên eşîrî û meylên nemedenî yên gelekî bêîteat, ji zagon û nîzamê nerazî karakterîze kirin (*Cf*. Zarinebaf, 2012: 93). **Lê, tam jî van dewletan bi awayekî sîstematîk midaxaleyî çêkirin an xirakirina 'eşîran' kirin. 'Daweyên eşîrî' û 'sîyasetên eşîrî' kişkişandin wek amrazekê ku gel ji hev dûr bixin û yekitîya neteweyî ya Kurdistanê lawaz bikin**.

Li Tirkîye û Îranê dewlet û rewşenbîrên dewletparêz bi awayekî sîstematîk **Kurdbûn û xwe-parastina ne ji etnîsîteya serdest wek eşîrtî bi nav kirin** (*Cf*. Chehabi, 2011: 196). Sosyologê Tirk İsmail Beşikci, ku berhemên wî rengdana dema leşkerîya wî ya li herêma Kurdan e, mînakên curbicur ên dîrokî, zagonî, sîyasî û çandî dide ku delîlên projeya îdeolojîk a demdirêj a veşartin û şaştemsîlkirina nasnameya Kurdî ne. Ew yekemîn akademîsyen e ku Kurdistan wek kolonîyeke navneteweyî dîtîye û li ser rewşa Kurdan xebitîye, wek weqayeke ku dikare bi ya neteweyên kolonîzekirî re bê berawirdkirin an ji wan xirabtir. Beşikci, **di yekem makezagona komarê de, wek delîleke mezin a "tehrîfata sazûmanî"** dide ser şopa **veşartina nasnameya Kurd a sazûmanî** (Beşikçi, 1986: 16-18). Beşikci angaşt dike ku makezagona Tirk "hewl dide realîteyeke sosyolojîk bi rêya alavên îdeolojîk çareser bike. Li gor makezagona 1924a, her kî li Tirkîyeyê dijî ji alîyê etnîkî ve Tirk e û *bi Tirkbûnê bextewer e*" (b.n.b., 1986: 8). Li alîyekî, wek pêşqebûl Tirkbûnê wek awayekî performansê an kirina axaftinê nas dike, lê dîsa jî hebûna yên ne-Tirk di nav sînorên Tirkîyeyê de înkar dike. Îlankirina zagonî ya paşxaneya etnîk a xelkê, ku pêşqebûla makezagona Tirkî bû, pesendkirina populer a neteweyê wergirt. Beşikci vê pêşqebûla xapîner wek ifadeyeke îdeolojîk dibîne, ku realîteya civakî ya hebûna hêmanên ne-Tirk xumamî dike (bnr., Beşikci, 1986 & 1990).

Di 1925a de, di mehên piştî vê makezagonê de, Tirkîye bû şahidê mezintirîn serhildana heta vê demê, ku ji alîyê hêza dewletê hat pelçiqandin. Piştî vê serhildanê plana 1925a ya bicîkirina mecbûrî û guhertina demografîya herêmê hat li ser navê şerê bi feodalîzm/eşîrtî û jinûvebelavkirina axê. Bi navê Projeya Islahkirina Rojhilat (Ş*ark Islahat Planı*) û Zagona Takrîr-î Sukûn (*Takrir-i Sükûn Kanunu*) dewletê hewl da hemû 'malbatên Kurd ên wek potansîyel xeter in' ji cîyê wan rake ku yên Tirk bîne dewsa wan (ji bo bêtir agahî bnr., Bayrak, 2009). Angaşta komarê ew bû ku ev zagon ji bo jiholêrakirina eşîrtîyê "û ji bo zagonên Komarê serdest bikin ku ji bo reformên li wîlayetên Rojhilat lazim in, hatine çêkirin (Zabitnameyên Meclîsê, di Yeğen 1999: 561 de). Lê, **di dawîya salên 1990î de dewleta Tirk Bucak Aşireti, ku ji deh hezaran bêtir zilamên çekdar dihewand, ji nû ve ava dikir û 'eşîr' biçek dikirin**. Mesut Yeğen, akademisyenekî din î xebatên Kurdî, dibêje polîtîkayên vederker ên dewleta Tirk bi rêya emilandina navlêkên wek "eşîrtî û peşverûtîya sîyasî" wek hevwateya Kurdbûnê, hatin formulekirin. Di eslê xwe de, dibêje Yeğen, "Gotara Dewleta Tirk", di hewldanên xwe yî sîstematîk ên ji bo jinavbirina Kurdbûnê -bi rêya emilandina berdewamî ya referansên jorîn- bêyî zanebûn nasnameya Kurd a li Tirkîyeyê tîne ziman (Yeğen, 1996 û 1999). Li alîyekî din, Beşikci dibêje înkara dewletê ya ne-Tirkan mecbûr kir hemû kesên li Tirkîyeyê dijîn raserîya etnîk a Tirkan qebûl bikin. Angaşt dike makezagonên 1924 û 1961ê, îlana zagonî ya raserbûna etnîsîteya Tirk bi gewde kirîye ji ber ku ev "[pêş]mercê şansa Tirkbûnê" bû (Beşikci, 1986: 13). Nasnameya Kurd hat qedexekirin, û pratîka înkarkirina nasnameya Kurd bisazî bû. Beşikci îdia dike ku her yek sazîyê, wek zanîngeh, partîyên sîyasî, dadwerî û çapamenî angaşt kirin ku "her kesê li Tirkîyeyê Tirk e û ji bo realîteya Kurd bidarizînin [çi ji destê wan hat kirin] (b.n.b.). Lê zêde dike dibêje, her tiştê ku dikaribû ne-tekbûna çand û etnîsîteya neteweyê îşaret bike, hat qedexekirin. Ev di Madeya 89a ya Zagona Cezayê ya Tirk a ji bo partîyên sîyasî de eşkere ye. Li gor vê, her partîyek ku ger çeşitdarîya sîyaseta Tirkîyeyê îma bike an "karakterê wê yî yek-çand û yek-etnîk" bide ber

NÎVÎSXANE

Eyyûb Kerîmî
Kurd wek Qurbaniyên Sê Îdeolojîyan*

Zeynep Sultan Atlı
"Şerê Newala Qeremûsê" di Klama Salihê Bey

Edith Szanto
"Zerdeşt Kurd bû!": Zerdeştîya Nû di nav Kurd de

Kamal Soleımanı
Kamal Soleimani: Dîndar çi Misilman çi ne-Mi Nikarin li Derveyî Paradîgmaya Netewe-Dewle

Fahriye Adsay
Şaro İ. Garip
Aqlê Protez ê Kolonîyê

HEMÛ BEŞ

Giştî

Gotar

Hevpeyvîn

pirsan, wê bê girtin (b.n.b. 13). Di vê xwendinê de, loma, Zagona Cizakirinê ya Tirkîyeyê ya 1966a **hemû îhtimalên ji bo naskirina welatîyên ne-Tirk ji holê rakir** (b.n.b.). **Ewçax wê nerazîbûna Kurdan çawa bihata binavkirin?** Nerazîbûneke wiha, wek Yeğen jî dîyar dike, wê her tim **wek "eşîrtî û paşverûtî" bihata binavkirin** (Yeğen, 1996 û 1999).

Hêjayî bibîranînê ye ku dewleta Osmanî li hin deverên bin desthilatdarîya xwe de ew tişta dibêjin "binyada eşîrî" bi awayekî radîkal guherand. **1858 reforma axê ya Sedrezam Midhat Paşa**, bi gelek awayan binyada civakî-sîyasî ya sê wîlayetên ku Iraqa îro pêk tînin, nû kir. Hin ji armancên wî yên sereke **dêmanîkirin,[9] pasîfîzekirina "eşîran" û firehkirina peywira leşkerîyê ber bi herêmên "eşîrî"** ve bû. Bi hewldanên wî gelheya koçeran heta yekem dehsala sedsala 20em daketibû nêvî (ji bo bêtir agahî bnr: Batatu, 1978 & Ceylan, 2011). Teşebisên bi vî rengî yên ji bo medenîkirina perawêzê dewam kirin heta avabûna Komara Tirkîyeyê. Wek mînak, di 1892ya de, dewleta Osmanî li Stenbolê dibistaneke nû vekir ku 'esilzadeyên eşîr' ên Ereb û Kurd veguherîne bike "karmendên sadiq ên Osmanî û wan şûn de bişîne 'nav eşîrên wan' da ku pêvajoya medenîkirin û Osmanîkirinê bidin dewamkirin. Qasî îlmên Îslamî, Tirkîya Osmanî, Erebîya klasîk, Frensizî û Farisî jî hînî wan dikirin (Makdisi, 2002: 788). Loma, **li Rojhilata Navîn emilandina eşîrtîyê wek mekanîzmayeke kontrola dewletê diçe heta serdema Osmanî**. Piştî hilweşandina mîrektîyên Kurd di nîvê yekem ê sedsala nozdemîn de, dewleta Osmanî peyderpey sîyaseta çekirin û xirakirina eşîran pejirand.

Reforma axê ya Midhat Paşa ya li jor qalkirî rêyek nû vekir li ber 'jinûveşikilgirtina eşîran' (Batatu, 1978). Ligel vê, **piştî serhildana Kurd a neteweperwer, dewletê sîyaseta xwe ya berê ber çav re derbas kir** û dibistanên eşîrê yên qalkirî û Siwarên Hemîdî dan destpêkirin di 1890an de (Soleimani, 2016).[10] Tevî milîtarizasyonê, Dewleta Osmanî terîqetên sufî û dîn jî bi kar anî ku 'eşîran' medenî bikin. Li gor Deringil, Stenbolê hin ş**êx wek barhilgirê medenîyeta** ji bo eşîran didît.[11] Ji şêxan re dihat gotin "[eşîrîyan] bi exlaqa dînî perwerde bikin û, heta ji wan tê hovîtîya wan kêm bikin." Serkêşên derwêşan her tim "navê Xelîfe bi bîr dianîn û "ji eşîran" re zelal dikirin ku "ew Xwedîyê wan e" (Deringil, 2003: 323). **A din, Kurdistan, ji ber ku herêmeke li ser sînor bû û girîngîya wê ya stratejîk zêde bû, bala Împeratorîya Osmanî ya bêtir li ser bû. Dewletê dixwest, bi biçekkirina eşîran li dijî him 'Kurdên wehşî' him Ermenan, Kurdan di nav sîstema Osmanî de bêtir entegre bike.** Ev wek qonaxeke ber bi asimîlekirina Mislimanan jî tê dîtin. Ji ber ku Siltan Abdulhamit II, carekê gotibû "hewce ye em hêmana Tirktîyê li Anadolê xurt bikin û [loma]**em berê Kurdan bikin parçeyek ji xwe**" (Heper, 2007: 47).

Piştî hilweşîna Împeratorîyê, Komara Tirkîyeyê, ji bo bikaribin komên Kurd ên parçebûyî îdare bikin, sîyaseta 'bike yek û îdare bike' îcad kirin, eşîrên biçek biçûktir kirin û kirin yekeyên rihet bên îdarekirin (Olson, 1996). Di desthilatdarîya Mustafa Kemal de, 'eşîrên Kurd ên cirnexweş' hatin disiplînkirin an hatin belavkirin an nefîkirin bo Anadolê an hatin mecbûrkirin tevkarîya dewletê bikin. Gotina "Tirkê Çîyayî"[12] pir baş nîşan dide ku bi kîjan awayî netewe-dewleta nû ya Tirkîyeyê Kurd çawa teswîr kirine û nasnameya wan înkar kirîye. Ev gotin ne tenê, wek yek ji şênîyên kevn ên herêmê, hebûna dîrokî ya Kurdan înkar dike, lê Kurdbûnê krîmînalîze jî dike. Dewlet, ji bo polîtîkayên jêbirinê dewam bike û **parastina nasnameya Kurd wek delaleta hovîtî, paşdemayîbûn û bêmedenîyetbûnê çarçove bike gotina navlêka "eşîr"ê bi kar anî**. Dewletê dikaribû bi piranîya Kurdan zimanê wan î dayikê bide jibîrkirin, **lê ti car 'eşîrtî'ya-bi destê-dewletê an kuştinên namûsê ji hole ranekir**. Gotara eşîrtîyê dikir ku dewlet ji alîyekî cudatîya etnîk rave bike, li alîyê din jî her cure behsa **heterojenîya 'netewe'yê krîmînalîze bike**.

Piştî Yekem Şerê Cîhanê, sîyaseta kolonyal a Brîtanî "binyada eşîrî" ya li gor dilê xwe ji nû ve ava kir û fireh kir li Kurdistana Iraqê (Maussen û yên din, 2011: 100). Di destpêka salên

NÎVÎSXANE

Eyyûb Kerîmî
Kurd wek Qurbaniyên Sê Îdeolojîyan*

Zeynep Sultan Atlı
"Şerê Newala Qeremûsê" di Klama Salihê Bey

Edith Szanto
"Zerdeşt Kurd bû!": Zerdeştîya Nû di nav Kurd de

Kamal Soleımanı
Kamal Soleimani: Dîndar çi Misilman çi ne-Mi Nikarin li Derveyî Paradîgmaya Netewe-Dewle

Fahriye Adsay
Şaro İ. Garip
Aqlê Protez ê Kolonîyê

HEMÛ BEŞ

Giştî

Gotar

Hevpeyvîn

1960an de, Abdulkerim Qasim, **ji bo ji heq neteweperwerîya Kurdî were serî li vejandina “eşîrtî”yê da** û ji ber vê di nav eşîrên Kurd de taktîkên nas bi kar anîn û piştevanîya eşîrên rikber ên [ewçax pêşengê sereke yê Kurd] Barzanî kir (Rubîn, 2007). Heman sîyaset dû re ji alîyê Sedam Husên hat pejirandin. Yê paşê ev sîyaset tevî planeke îmhakirin û jinûvesazkirina nasnameya Kurd, ku manîfestoya eşîrtîyê ye, emiland. Sedam li temama Iraqê, ji tunekirina ‘şêxên eşîrî’ zêdetir, şêx manîpule kirin û kontrol kirin bi polîtîkayên Beasîkirinê (Baram, 1997: 1). Wî **partîya Beasê û artêşa Iraqê jî kir eşîr, û ‘hesta sedaqata eşîrî’** (muxayel an rastîn) **ber bi desthilatdarîya xwe ve fireh kir**, heta wek ‘eşîr’ qala Partîya Beas dikir. Sedam, bi îmalkirina hin têkilîyên merivantîya kevneşopî, bi rêya tehsîskirina erd û çavkanîyên din, di navbera eşîrên-dewletê-çêkir de awayên curbicur ên rikberîyên civakî-sîyasî saz kir da ku desthilatdarîya xwe li temama Iraqê qewî bike (Hassan, 2007).

Sîyaseta eşîrîkirinê ne tenê desthilatdarîya Sedam xurt kir, li temama welêt li herêmên dûrtirîn jî, hakimîyeta sîyasî ya Partîya Beasê ya fetisînok hêsan kir. Jê wêdetir, **bi rêya politîkayên jinûve-eşîrîkirinê, rejimê cureyek ‘ruhê eşîrî’ bi sazî kir ji bo nifşên paşê jî**. Divê bê destnîşankirin ku daxilkirina binyada eşîrî, girêyên merivantî û zincîrên herêmî ya nav rêvebirîya sîyasî hê berîya desthilatdarîya Sedam dest pê kiribû. Wek mestere, di 1963ya de, Serokkomar Ahmed Hesen el-Bekir û grûba wî (General Herdan Abdulxefar el-Tikrîtî, General Hemad Şîhab û Sedam Husên) hemû ji heman bajarî bûn û bi merivantîyê digihiştin hev. Her çiqas ev navlêk hewce nake bê maneya têkilîyên xwînî jî, wan wek “pismam” xitabî hev dikirin (Blaydes, 2013). Her wiha, parêzvanên Sedam Husên jî (wek *el-him* dihatin zanîn) hema hema giş ji heman eşîrê û ji heman herêma cografî bûn. Bi gelemperî, piştgirîya neyekser a hin şêxên eşîrî û nasnameya eşîrî di merhaleyên dawî yên şerê Îran-Iraqê (1988-90) de di medyaya Beasî de xwe nîşan dida. Di vê serdemê de bû ku şêxên eşirî alenî sedaqeta xwe bo Sedam îlan dikirin.

Li Îranê jî, bi hilatina dewleta neteweperwer, projeksîyona eşîrtîyê li ser civatên bindest “gelekî zêdetir belav bû û propagandaya wê hat kirin, li hemberî berhengarîyên Êndin, wek rewakirina komên etnîk ên hâkim ên desthilat” (Soleimani 2017: 959). A din, “**etifkirina eşîrtîyê armanceke wê ya bikêrtir hebû ji bo rewakirina berfirehbûna** şideta **dewletê**” (b.n.b.). Kaveh Bayat, akademisyenekî Îranî, raber dike “dêmanîkirina ku di navbera salên 1933-1937an de li Lûristan, Fars, Azirbêcan û Xorasanê pêk hat, ket şiklekî pir zalimane, hin caran jî ket şiklê qirkirinê” (Bayat, 2003: 229). **Lê, di serdema piştî** Şoreşa **1979a, dewleta Îranê bi awayekî çalak hewl da cureyeke nû ya eşîrtîyê li gor hisabê dewletê ji nû ve bide naskirin**. Ji bêcîkirinê heta teklîfkirina teşwîqên aborî, bi emilandina hin stratejîyan, dewletê hewl da hin beşên civaka Kurd biçek bike **da ku bi neteweperwerîya Kurdî re** ş**er bike**. Bi hêvîya vejîna ‘binyadeke eşîrî’ li Kurdistanê, dewleta Îranê cehd kir reforma axê ya Şah berovajî bike. Sîyaseteke wiha wê civaka Kurd parçe bikira, bi taybetî wê têxista çala zemanê berê xwedîyên erd û cotkar li hember hev rakira (û heta radeyekê ev kir jî). Ji vir, **serokên ‘eşîran’ di karûbarên gundan de hatin peywirdarkirin û wek parçeyek ji amûrên îdareya dewletê hatin qebûlkirin**. Di gelek halan de, dewletê kir ku gundî nikaribin li gundên xwe bimînin: Ji wan re hat gotin an rahêjin çekan an biterikînin. Dewletê propagandaya ‘eşîrtî’yê kir û ew bi pêş xist. Heta **Xumeynî digot “eşîr xezîneyên** Şoreşa **[Îslamî] ne.”[13]** Di heman demê de, **dewlet bi tevgera neteweperwerîya Kurdî re dixeyidî ku ew eşîrî ye û “tehdîd e ji yekitîya Umeta Îslamî ya li Îranê re**” (Saleh, 2013: 68).

Li Îranê, wek li welatên cîran, dewleta niha vegerîya ser “eşîrtî”yê ku wê ji nû ve çêbike û li gor stratejîya xwe berfirehtir bike. Di navenda modernîzekirina Pehlewî de “medenîkirina eşîran” hebû. Di 1939a de, ji bo “binîzamkirina karên eşîrî” dewleta Pehlewî Sazîya Karûbarên Eşîrî ya Îranê *(Sazemān-e Omūr-e ʿAshāyer-e Iran)*[14] damezrand, ku qaşo wan entegreyî nav cîhana medenî bike. Ji dewleta Pehlewî cuda, sîyaseta dewleta Îslamî jinûvesazkirina wê kir karê xwe, ku “eşîrtî” kir realîteyeke civakî ji bo cîhana akademîk ya

NÎVÎSXANE

Eyyûb Kerîmî
Kurd wek Qurbaniyên Sê Îdeolojîyan*

Zeynep Sultan Atlı
“Şerê Newala Qeremûsê” di Klama Salihê Bey

Edith Szanto
“Zerdeşt Kurd bû!”: Zerdeştîya Nû di nav Kurd de

Kamal Soleımanı
Kamal Soleimani: Dîndar çi Misilman çi ne-Mi Nikarin li Derveyî Paradîgmaya Netewe-Dewle

Fahriye Adsay
Şaro İ. Garip
Aqlê Protez ê Kolonîyê

HEMÛ BEŞ

Giştî

Gotar

Hevpeyvîn

Îranê. Dewletê **Lijneya Bilind a Eşîrên** Îranê (*Shuray-e 'Ali 'Ashayer-e Iran*) dirust kir bi peywira rêvebirin, kontrolkirin û komkirina Yekeyên Eşîran ên Seferberîya Sînoran (*Basije Marzban*).

Ev sazî ji avabûna xwe ya di 1981ê de vir de *Sêmehaneya Eşîran: Xezîneyên Şoreşê* (*Faṣlnāmah-i ʿAshāyerī-e Ẕakhāyer-e Enghelāb*) diweşîne. Hejmara dawî ya kovarê di 2017a de derketîye. Nayê gotin ku ev nav ji gotina navdar a Ayetulah Xumeynî hatîye wergirtin: **Eşîr Xezîneyên Şoreşê ne**. Bi hêvîya ku gotinên wan bêtir "bibin sîyaseteke karîger û eşîrên li Îranê binîzam bikin," ev sazî bi awayekî rêkûpêk mazûbantîya konferansan dike.[16] Tevî 'berhemên zanistî' yên akademisyenên Îranî yên li ser eşîran, li beşên sosyolojîyê dersên bi navê "Sosyolojîya Eşîr û Koçeran" (*Jāmeʿah-shenāsī-e Īlāt o ʿAshāyer*) ders tên dayin. A din, Komeleya Sosyolojîyê ya Îranê şaxeke akademîk a fermî damezrandîye bi navê "Sosyolojîya Gund û Eşîran," ku xwedêgiravî li ser meseleyên eşîrî yên li Îranê disekine.[17] Di nav çend salên dawî de, Zanîngeha Şoştarê dest bi weşandina kovareke bi navê Sêmehaneya Eşîr û Koçeran (*Faṣlnāmah-i Īlāt o ʿAshāyer*) kirîye.[18]

**Ber bi demîstîfîkasyona (bêesrarkirin) eşîrê**

Teorîya civakî ya postkolonyal ku di salên 1960an peyda bûye û berfirehtir dibe, û xwe ji post-kolonyalîzmê xwedî dike, di zanistên civakî de meylekê temsîl dike ku rastîya îdiaya objektîfbûnê dide ber pirsan. Giredayî vê, nebûna navlêkeke zelal ji bo xistina şûna 'eşîrî' û 'eşîrtî'yê divê emilandina bi israr a kategorîyên kolonyal ên şêlû, zordarane, û gewherîker rewa neke.

